

Hemas... Hizrek genî

Nayif Elî Îbo

Bizava Hemas ya filestînî ji destpêka xwe de û heya niho, her kiryareka ku dijî cuhiyan pê rabûyî, di demek nîzîk yan dûr de, dikeve di xizmeta cuhiyan bi xwe de, ango ne di berjewendiyan filestîniyan de ye, çunkî kiryarên wê dijî bizava aştiyê ne, ya ku xelkê filestînî zor pêdivî pê hene. Serê çend salan e şer û pêkdadan belê ji bilî wêran û talaniyê negehişte filestîniyan. Li sala 1948-ê demê biryara miletê yekgirtî derketî pêşkkirina Filestînê, ango nîvîkirin di navbera filestînî û cuhiyan de, ereba qebûl nekir, eha evro 4 / 1 , bi çarêkê jî bawer nakin.

Bizava Hemas bi hişkbaweriya xwe bo egerê peydabûna rewtê hişke baweriyê di nav cuhiyan de. Çend ew cuhiyekê bikujin, li beramber bi dehan seran didin, hizra Hemas hizreka sitewr e, genî û paşverû ye, li gel pêşveçûn û siyaseta evro nagunce. Ew hewl dide wî şêweyî bi kar bihîne yê ku ew bi xwe pê lawaz beramberî dijminê xwe, ango bi karhînana çekî. Aşkere ya ku dijminê wan çekê here pêşketî heye. Li vir, bo me diyar dibe ku ew baştirîn xizmetê digehînin dijminê xwe, ku çi car filestînî bi ser nekevin û negehin armancên xwe.

Bizava Hemas palpişta rêkxirawên terorîstî ne li cîhanê, li gel rijêmên kevneperistên ayinî û netewî ne mîna; rijêmê Îran û Sûriyayê, lewra Hemas jî evro palpişta xwe diyar dike bo wan bi taybet demê ku pesnê Al- Zerqawî kirî, piştî ku li roja 7-6-2006-ê hatiye kujtin. Hemas ew wek şehîd û qehremanê miletî li qelem da çunkî baş dizane ku xizmeta Al - Zerqawî kirî bo dijminên miletê Îraqê ne dûre ji xizmeta Hemas bo dijminên filestînê kirî. Eger dirindeyek yan têhnîtirîn kes li cîhanê bo kujtin û talankirina bêguneh û arezûya wî jêkirina seran û komkirina kiloxa be, eger ew qaremanê miletî be, nexwe paşeroja wî miletî dê çawan be gelo?

Mejiyê Hemasê ne ew mejî ye ku dewletekê bi rê ve bibe. Û eger deshelat ma di destê Hemasê de, ez bawer dikim ku ew erdê cuhiyan hêj pê lê nekirîn, çi axa Filestînî be yan ji dewrûber be, dê pê lê bike û buhayê xwîna filestîniyan rijandî dê weha lê bike ku kêmtir lê bihê ji buhayî xwîna berxek lawaz.